



Australian Government

**COVID-19**  
✓ **VACCINATION**

# Vaksînên COVID-19: pirsên Hevpar

07 Îlon 2022

## Ji bo çê ez vê vaksîna COVID-19 li xwe bidim?

COVID-19 dikare bibe nexweşîyek giran. Bi tayîbetî ji bo kesên bêhêz ên nav civak xetereke e. Vaksînlêdan yek ji awayên çêtirîn e ku hûn xwe û civaka xwe biparêzin ji nexweşîyên pir giran an mirina ji ber COVID-19.

## Kî dikare vaksîna COVID-19 li xwe bide?

Herkesên temen 5 salî û mezintir ên li Australia dijîn dikarin vaksîna COVID-19 belaş li xwe bidin. Heke we li clînîkek hukûmetê vaksînê li xwe da hewce bi kertê Medicare nine. Hun dikarin clînîke û çêkirina radevûyek bo wergirtina vaksîna COVID-19-a xwu bi rêya dîtkeza clînîka vaksînê li ser vê malperê bidest bixin <http://covid-vaccine.healthdirect.gov.au/>

Hinen zarokên temen ji 6 mehî heta 4 salî bi ên bi kêmasiya xidar a parastina bûnyatê, seqetbûn, û yên bi şert û mercên tenduristiyê yên tevlihevî û/an pircûre bi wana re hene ku rîska wan a bi pêketina COVID-19 a giran zêde dike mafdar ku vaskîna COVID-19 li xwe bidin. Metirsiyek zêde heye ku van zorok ji ber COVID-19 bi nexweşîyek xidar bikevin. Çêkirina qewlek/radevûyek ji bo ew kesên di nav komika vî temenîda ne dikarin bi rêya Vaccine Clinic Finder çêbikin: <https://covid-vaccine.healthdirect.gov.au/>

Ji bo parastina li hember nexweşîya giran a ji ber COVID-19, li gorî ku ji bo temen û hewcedariyên tenduristîya we tê ye pêşniyarkirin, vaksînlêdanên xwe yên COVID-19 nûve bikin.

## Ji bo çend dozajên COVID-19 hewce dike da ku ezê li hempayê nûveyî rojane bimînim?

Parstina ji vaksîna COVID-19 bi demê re kêmtir dibe. Guhertoyên nû yên COVID-19 di heman demê da pir bas in ku ji berevaniya microvan dîr bixe. Wergirtina hemî dozajên vaksînên COVID-19 ku ji bo temen û hewcedariyên tenduristîya we têne pêşniyar kirin dê bibe alîkar da ku hûn pê ewle bibin ku parastina we li dijî nexweşîyên giran ên ji ber COVID-19 bête domaandin.

**Dozaja sêyem** ji bo her kesên 16 salî û mezintir ku 3 meh berê dozaja xwe ya sereta ango a pêşîn we li xwe daye tê ye pêşniyar kirin. Dozaja sêyem jî ji bo hin kesên 12 û 15 salîyan têne pêşniyar kirin heke bi wanare hinek mercên tenduristiyê hebin.

**Dozaja çaremîn** a vaksînê ji bo her mirovên 50 salî û mezintir tê ye pêşniyar kirin, û mirovên 16 salî û mezintir ên di xetereya nexwesîya giran a ji ber COVID-19 de ne. Kesên di navbera 30 û 49 salî de jî dikarin dozajek çaremîn li xwe bidin heke ku ew helbijartin. Hûn dikarin 3 meh piştî dozaja xweya sêyemîn dozajek çaremîn werbigrin.

Hin kesên dibe ku hewcên wan bi **dozajek zêde** hebe heke ew bi giranî xwedan qelsîya parastina pergala bûnyatê bin. Ev ji ber vê yekê ye ku mirovên ku bi giranî xwedan qelsîya parastina bûnyatêne di xeterek pir mezintir de ne ku ji ber COVID-19 nexweş bikevin.

**Ji bo bêtir agahdarî li ser dozajên vaksînê, di nav de mafdariya dozajên sêyemîn, çarem û zêdetir, serdana vir bikin:** [www.health.gov.au/resources/translated/covid-19-vaccination-when-to-get-your-vaccination-other-languages](http://www.health.gov.au/resources/translated/covid-19-vaccination-when-to-get-your-vaccination-other-languages)

Heke hûn nebawer in ku hûn ji bo koma temenên we çî dozaj hewce dike da ku hûn nûve biminin û hewcedariyên tenduristîya xwe, bi doktorên xwe re bipeyîvin.

## **Kesên kû bi COVID-19 ketibin hê hewcen kû dîsa vaksînê li xwe bidin?**

Belê, heke hûn kû bi COVID-19 ketibin û ji nexweşiyê xilasbûbin ji disa divê ji dozaja vaksînê COVID-19 ya paşîn werbigrin wê parastina we zêdetir bike û statûya vaxslêdana COVID-19 ya rojwar ango hêmpemahîn a nûvemahîna we temam bibe û were cîh. Pir îhtimal e ku parastina ji nuvegirtinê bi demê re kêm bibe.

Heke encama testa we ya COVID-19 erênî derkeve, divê hûn piştî nexweşiyê/enfeksiyonê 3 meh bisekinin berê dozaja vaksîna COVID-19 li xwe bidin.

## **Kêja vaksînên COVID-19 ji bo bikaranînê li Australia hatine pejirandin?**

Bikaranîna çar vaksîn/derzîyan li Australia hatîye testîqkirin: Comirnaty (Pfizer), Spikevax (Moderna), Nuvaxovid (Novavax) û Vaxzevria (AstraZeneca).

Di derheqa vaksîna COVID-19 zêde bi zimanê we bixweynîn:

1. Vaksîna Pfizer: <https://www.health.gov.au/resources/translated/covid-19-vaccination-information-on-covid-19-comirnaty-pfizer-vaccine-other-languages>
2. Vaksîna AstraZeneca: <https://www.health.gov.au/resources/translated/covid-19-vaccination-information-on-vaxzevria-astrazeneca-covid-19-vaccine-other-languages>
3. Vaksîna Moderna: <https://www.health.gov.au/resources/translated/covid-19-vaccination-information-on-spikevax-moderna-covid-19-vaccine-other-languages>
4. Vaksîna Novavax: <https://www.health.gov.au/resources/publications/covid-19-vaccination-information-on-nuvaxovid-novavax-covid-19-vaccine>

## **Vaksînên COVID-19 bi çî awayî dixebitin?**

Vaksînên COVID-19 jî wek vaksînên din dixebitin. Ev pêzansiyê dide laşê we da ew li dijî vîrûsa ku dibe sedema nexweşiyê şer bike, berî ew bixwe nexweşîna ji were peyda bike. Vaksîna COVID-19 alîkarîya beden/laşê mirova dike da ew vîrûsa kû dibe sedema COVID-19

nas bik û li dijî wan şer bike. Ev COVID-19 nahewînîn û hûn nikarin COVID-19 ji bo we vaskîne li xwe daye pê bikev in.

Vaksînên COVID-19 yê ku ji bo karanîna li Australia hatine pejirandin hatine destnîyan kirin ku di parastina li heber nexweşiyên giran, çûna nexwexaneyê û mirinê de pir baş in.

## **Gelo vaksînên COVID-19 bi ewle ne?**

Rêveberiya Xweseriy ya Tedawîyê (TGA) zanyar û pisporên bijîjkî ne ku vaksîn, erman û hilberên bijîjkî yê din ên ji bo karanîna li Australia bi rêkûpêk û pejirandî ne. TGA hemî ew vaskînen COVID-19 ji bo kalîte, ewlehî û bandorkeriyên control dike berî ku wan ji bo karanîna li Australia erênî bike. Ev heman pêvajoyek e ku hemî vaksînên li Australia têde derabs dibin.

Pisporên bijîjkî yê li TGA bi domdarî hemî vaksinan control dikin da ku pê pişterast bin ku ew ewlene. Vaksînên têne pejirandin piştî ku ew hatin nirxandin da ku nîşan bidin ku feydeyên vaksîne ji her heteroyê zêdetir in.

## **Gelo Vaksînên COVID-19 î zûtirîn hatin pêş xistin?**

Vaksînên bo COVID-19 hatine pêş xistin bi ewle û bi bandorin. Lê belê lêkolerê di despêka pandeyê de li seranserê cîhanê gelek karek giran ji bo pêşxistina vaksîna COVID-19 dikin. Heman pêvajo ji bo vaksînên din jî hate şopandin, û tu gave nehat ji piştgox xistin.

Vaksînên COVID-19 zûtirîn hatin bidest xistin ji ber kû:

- yarmetî a fondek mezin hatîye veberhênanin ji bona çêkirina wan hate dayîn
- nûbûyînn û hebûna peyde bûyîna teknoloji a amade bû egera zêturşb pêşveçûyîne
- lêkolîner, zanyar û hilberînerên seranserên cîhanê bi hev re kar kirin
- Hin gavên ceribandînen klînîkî u pêvajo ya pejirandinê di heman demê de qewimînye, li şûna yek li dê ya din.

Vê yekê di zûtirîn dem de gihîştina vaksînan da me.

## **Zarok dikarin ku vaksînên COVID-19 li xwe bidin?**

Hemû kesên li Australia ku di xetereya girtina COVID-19 de ye, di nav de zarok û ciwan jî, Her çend piraniya zarok û ciwanên ku bi COVID-19 dikevin xwedan nexweşiyek sivik in, hin hîn jî dikarin pir nexweş bibin. Piştrastkirina zarok bi vaksînlêdanên xwe yê COVID-19-ê re wê vê xetereyê kêmtir dike.

Pisporên derzîlêdanê yê Australia, Australian Technical Advisory Group on Immunisation (Koma Şewirmendên Teknîkî yê Australia) (ATAGI), pêşniyar dike da ku zarokên temen 5 salî û mezintir li hember COVID-19 bêne vaksîn kirin.

Hin zarokên ku temenê wan ji 6 meh heta 4 salî ne mafdarin ku vaskîna COVID-19 werbigirin heke ew bi griyanî xwedan qelsîy aparastina bûnyatê bin, û hem jî yê kû xwedî şert û mercên tenduristiyê yê tevlihe û/an pir cûre ne ku xetera wan a nexweşiya giran ji ber COVID-19 zêde dike. Metirsîyek zêde heye ku ev zarok ku ji ber COVID-19 pir nexweş bikevin.

Hun dikarin ji bo vaksîna COVID-19 ya zarokên xwe bi rêya karanîna Vaccine Clinic Finder li ser vê maperê (<http://covid-vaccine.healthdirect.gov.au>) radevûyek çêbikin.

## Dibe kû jinên bi hemle/dûcanî bêne vaksînkirin?

Di dema bihemlebûyîne/dûcanîye de COVID-19 xetera tevlihevîye ji bo jinên bihemle û zarokên wan ê nezayî zêdetir dike.

Heke hûn bi şewba COVID-19 bikevin, dibe kû:

- rîskeke zêde ya pêwîstiya çûyîna nexweşxaneyê heye
- îhtîmala şansek kêmtir heye ku ptik zû ji dayik bibe û hewce bike ku here nexweşxanê
- rîzka mirina pitikê mirî zêde ye (zarok/pitik ku sax nayê dinyayê).

Di dema bihemlebûnê/dûcanîye de wergirtina vaskîna COVID-19 di her kêliyê de riya çêtirîn e ku meriv li hember van xetereyan biparêze.

Vaksînen Pfizer û Moderna vaksînen kû tene tercîh kirin ji bo li xwe bidin heke hûn bihemlene, şîrdidin an plankirina we bo bihemlemahîne dikin. Heke hûn nikarin van vaksîna bidest bixin, hûn dikarin vaksîna Novavax an AstraZeneca li xwe bidin. Jin dikarin di hemû heyamên bihemlebûyîne da vaksîne li xwe bidin.

Lêkolînen berfireh ji seranserê cîhanê didin dîyardikin ku Pfizer an Moderna ji bo jinên bihemle û şîrdidinbi ewle ne.

Di derbarê ewlehibuna vaksîna Novavax an AstraZeneca de li ser jinên bihemle ango ducanî an şîrdanê de dane/datayê klînîkî di destê tune. Lêbelê di derbarê ewlehîya Novavax ji bo dema bi hemlebûyîne tû gumanên nerênîna tune ye ji ber ku ew ne vaksînek zindî ye. Ewlehiya vaksîna Novavax ji bo jinên ducanî û ên şîrdanê de şopîna çavdêriyê tîye kirin.

Ji bo dîtina zêdetir agahdarî li ser ewlehiya vaksînen COVID-19 di dema ducanîye an şîrdanê de bi doktorên xwe re bipeyivin.

Agahiyên zêdetir hûn dikarin liser [www.health.gov.au/resources/translated/pregnancy-and-covid-vaccines-other-languages](http://www.health.gov.au/resources/translated/pregnancy-and-covid-vaccines-other-languages) bibînin

## Ezê çawa ji bo vaksîna xwe ya COVID-19 qewlek çê bikim?

Hûn dikarin klînîkek ji bo vaksîlêdana xwe ya COVID-19 bi rêya [Vaccine Clinic Finder](http://VaccineClinicFinder) li ser <https://covid-vaccine.healthdirect.gov.au/booking/> Hûn her dîsa dikarin tîlefonî 1800 020 080 bikin û ji bo kargûzarîya tercûmanîya belaş vebijarta 8 biniqînin.

Hûn dikarin li ba diktorên xwe an bi ew dermandêr civakî yê pêşdarbûyî bi axîfin ji bo çêkirina qewlek bo lêdana vaksîne.

Hûn disa bi hêsanî dikarin radevûyek bo qewlê lêdana vaksîna COVID-19 bi rêya xizmetgûzarîya Easy Vaccine Acces (EVA) çê bikin. Bi vê xizmetgûzarîyê, karbidestek ji navenda xizmeta bi tîlefonê tîye dayîn tîlefonê we bike û qewlek ji were dayne. Eva her roj amadeye kadjimêr ji 7am heya 10pm (AEST). Bi rêya tîlefonek mesajek li ser 0481 611 382 li gel 'Hey EVA' birê ke, û wê EVA bi Înglîzî ji we vana ji bipirse:

- nav
- zimanên hûn tercîh dikin
- welayet û herêmên hûn lê dimînin
- tercîha kad û kadjimêr kû tîlefonî we bikin
- hêjmara tîlefonê a herî qenc bo bang bikin.

Karmendek perwerdekîrî wê paşê telefona we di qewlê we danîye bike bo yarmetîya ku ji bo vaxsîdana we a COVID-19

## **Me ev vaxsîn COVID-19 wê bibin sedema bêberîti ji bo mezinan, an ji bêbertîya pêşerojan ji bo zarokan:**

Tû delîlên zanîyarî dîyarî nakin ku vaxsînên COVID-19 dibine sedema bêbertîyê an jî qisîrbûyîne di nav mêran an jî jinan de.

Tû delîlên zaryarîyê di destê nînin ku vaxsînên COVID-19 ku wê di pêşerojan problema bibertîyê ji bo zarokan çêbik e.

TGA wê Australia bikaranîna tû vaxsînekî nepijîrîne heke ew ne bi ewle û bi bandor bin. Ev tê vê wateyê ku TGA dê we tû vaxsîndanê nepijîrîne ger ew bandorek li ser bêbertîya jinan an jî mêra bike. Lêkolînên zanîyarî dîyar nakin kû ev vaxsîna COVID-19 ji alîyê TGA hatine pijirandin bandor ango dibin sedema bêbertîyê.

## **Ezê Bendewarîya çî hesasî/bandorderî ên vaxsînên COVID-19 bim?**

Hemî vakasîn çendî hesasî peyde dikin. Ev hesasîyet piranîya wan sivikin û ji bo çend rojan didomîn e.

Dibe kû ji wan hesasîyan hinek ev bin:

- êşa li sermil a piştî derzîyê
- ta/agir
- êşa masûlan
- serêşî.

Heke pirsek we an jî xemgînîyek we piştî we vaxsîne li xwe da, pêwendî girê bidin bi diktorê xwe an jî ew klînîka kû we vaxsîne li we xisti ye.

Heke symptom/nîşanên we xidar in, hûn dikarin banga abûlansê li ser Sê Sifir/Triple Zero (000) bikin da ku we bibe nexweşxanê. Hek hûn nikarin bi Înglîzî qise bikin, dema we tîlefona Sê Sifir (000) kir daxwaza 'ambulance' bikin, pêwîste hûn li ser xetê bimînin û daxwazîya tercûmanekî bikin.

Wê xeta karûzarîya acîlyetê Sê Sifir (000) tîlefona Translating and Interpreting Service bike û piştî pêwendîya we bi tercûmanekî re saz bû bi xeta pê pêşîndêr ku rojane 24 kadjimêr, her rojê salê vekirî ye.

Di nav nîşan/semptomên xidar dikare ev hebin:

- hebûyîn a astengîya nefis/bîhndanê
- xizînî,
- hebûyîn a kulpîna dil a bilez, an
- hilweşîn/ketina ser kadê.

## **Ma gelo li Avustralya vaxsînên COVID-19 emirwaqî ye?**

Na, derzîledan a bo vaxsîna COVID-19 bi dilxwazî ye. Mîrov dikarin biniqîn heke bixwazin vaxsîna COVID-19 li xwe bidin. Hûnê ti cîzakî ji bo we derzî li xwe neda ye megrin.

Vaksînlêdana li dijî COVID-19 hewcedarîyek bo ew karkerên niştecih-ê lînêhrîna cîhê pîran. Hinek wîlayet û herêm şer û şîrûdên wan di warê vaksînlêdanê ên tayîbet hene. Îstîsna ji bo ew kesên kû ji ber mercên tenduristîya wan ku nikarin bêtne vaksînkirn.

## **Gelo yek ji wan vaksîna ên ji dervayî welêt ezê bikaribim li xwe bidim?**

Kesên li Avustralîya dijin tenê vaksîna COVID-19 kû ji aliyê TGA a Australia da hatî pijirandin bo bi karanîna wan li Avustralîya bi tenê ye. Dibe ku her ev vaksîn li welatên din ji hatibe pijirandin têye bi karanîn. Divê hûn hewil medin û vaksînen COVID-19 li ser onlinê bikrin, ewana ihtimalek mezin ew ne bi ewle bin an ji dibe kû ên sexte bin.

## **Biştî kû min vaksîne li xwe da, divê hê pêwistî pê heye ez ji bo hêdîbûna belavbûyîna COVID-19 tedbîrên din bigrim?**

Piştî we vaksîna xwe li xwe da, ewa grînge kû hê kû hûn bi awayek bi tedbîr tevbigerin da bo hêdîkirin a belavbûyîna COVID-19.

Tedbîrên hêsan ên mîna 1,5 metre dûrî kesên din, şuştina destên xwe bi rêkûpêk bi sabûn û avê, mayîna li male dema ku hûn nexweş in, test kirina ji bo COVID-19 û li xwe kirina maskek dikare bibe alîkar ku belavbûna COVID-19 hêdî bike.

## **Ma wê vaksînen COVID-19 bi kêra kar bîn heke COVID-19 bê guhartin?**

Di nav demê da hemî vîrûs tene gohastin. Ji vê re 'mutation' tê gotin. Delîlên zanîyarîyê ên heta neha dîyar dike kû vaksînen COVID-19 dikare yarmeti bike bo parastina li hember nexweşîyên girana mutations nû COVID-19. TAG wê bi berdewamî wek beşek ji pêvajoyên erêkirin û şopandina wan a asayî ji nêz ve çavdêrî bike.

Di pêşerojê de, dibe ku vaksînen COVID-19 ji bo mutasyonên cihêreng ên COVID-19 werin guhartin. Ev yeka niha bi derzîlêdana girpê her sal pêk t. Lêkolîner û hilberînerên vaksîne lîkolînan li ser veyekê didomîn in.

## **Ma gelo wê Înfluenza bikari min li hember COVID-19 biparêz e?**

Influenza (grîp) û COVID-19 her dû ji vîrûs in, lê belê her ne yekin. Înfluenza ji bo COVID-19, an ji parastnê nade.

Wê vaksîna COVID-19 li heber grîpê parastinek pêk meyne. Têye pêşniyar kirin ku hem înfluenza û hem ji a COVID-19 bi ewlehî li xwe bidin. Mîrov dikare di heman rojê de vaksîna COVID-19 û vaksîna înfluensayê/sermê li xwe bide.

## **Wê vaksînen COVID-19 genên min an jî DNA-a min bigûhrîne?**

Na, vaksînen COVID-19 wê genên we an ji DNA we megûhrîne.

Hinek vaksînen COVID-19 perçeyek RNA-ya peyamber (mRNA) bikar tînin da ku ji laşê we re bibêjin ku li dijî COVID-19 bi bin xwedan bertekek xweparastinê. Vaksîn bixwe COVID-19 nadin we.

AND celebek mekulên cûda ye ji cinsê vaksînen RNA yê ne ku di vaksîna mRNA de. mRNA tiştêkî bi AND-ya we nake û piştî ku dikve laşê we di demek kurt de perçe dibe.

## Wê ev vaksîn genên min an ji DNA-ya min bicivîne?

Na. Dema we vaksîn li xwe da, ew diçe hindirî bedena we, bi asasî dikeve hindirê masûlên li ser jorî mile we. Li Avustralîya vaksînên COVID-19 bi derzîyan li mîrovan tê xistin. Bi lêdana vaksînêdana COVID-19 Gen an jî DNA nayê berhev kirin.

## Wê vaksînên COVID-19 min bi internetê re bide girêdan?

Na, wê vaksîna COVID-19 vê pêk neyê – û qet nebe- pêwendî ya we bi internetê ra çê meke. Ev vaksîn berhemk pişikî ye û ne dijîtal e.

## Gelo di vaksîna COVID-19 de mikroçîp heye an teknoloji a şopandinê heye?

Di vaksîn a COVID-19 da tû software an jî mikroçîps tûne ye. Nikare bi pey şopa mîrova bikeve.

## Wê vaksîna COVID-19 dikaribe COVID-19 bigihîne min?

Tu Vaksînên ku li Avustralîya hatine pijirandin di nav wana da virûsek zindî kû dibe sedema COVID-19 nîne. Ev tê vê wateyê ku vaksîna COVID-19 nikare we bi COVID-19 nexweş bike, û vaksîn nahêle ku hûn vîrusê babêjin.

Hinek ji hesasîyetên ji ber vaksîna COVID-19, wek agir, êşa masûlan û mendûmayîn, dirûvê nîşanên semtom a COVID-19 ne. Ev semtom/alamet reaksiyonek vaksîndayînê ye û noraml e. Ev yeka dide dîyarkirin kû bedena mîrovan li dijî vîrusa COVID-19 lêkirina parazîyê pêk tine.

## Di nav derzîyên COVID-19 de hilberên heywanan hene gelo?

Ew vaksînên kû li Avustralîya ji bo bikaranînê hatine pijirandin di nav wan de tû hilberên heywanan, hen goş û ên mirîşkan tûne ne.

## Bawerîya pêşengên older/ayîni di derheqa COVID-19 çî difikirin?

Vaksînên kû li Avustralîya hatîye pijirandin bi bikaranînê ji hêla piranîya pêşengên oldaran hatîye destûrd dayîn.

Roja 22 yê meha Cotmehê, Vatikanê pişgirîya dike bo bikaranîna vaksînên COVID-19. Hûn dikarin vê beyanat a Vatikanê li ser vê malparê bixînin.

[https://www.vatican.va/roman\\_curia/congregations/cfaith/documents/rc\\_con\\_cfaith\\_doc\\_2021221\\_nota-vaccini-anticovid\\_en.html](https://www.vatican.va/roman_curia/congregations/cfaith/documents/rc_con_cfaith_doc_2021221_nota-vaccini-anticovid_en.html)

Australian Fatwa Council di roja 13 Sibatê a 2021 COVID-19 Vaccine Fatwa yek ji bo pişgirîya COVID-19 belav kir. Ev fetwa piştî lêkolîn û niqaş di derheqa vaksînên COVID-19 li gel diktorên Misilman û pisporên pizîşkî ên pêbawer hate dayîn. Ev fetwa şîretmendî dike kû ew vaksînên COVID-19 li Avustralîya tene bikaranîn bi gorî qanû Îslamê ne. Hûn dikarin daxuyanina Australian Fatwa Council's COVID-19 Vaccine Fetva li ser vê malperê bixwînin.

<https://www.anic.org.au/fatwa-council/>

Australian Islamic Medical Association di roja 13 Tebax-a 2021 yekan beyanameyek di derheqa vaksînên COVID-19 çapand. Hûn dikarin vê belavokê li vir bibînin

<https://aimamed.com.au/feature-content/>

## Ezê bi kêra têtikiye çêkim dema pirsek min li ser vaksîna COVID-19 da hebû?

Heke hûn dixwazin di derheqa derzîyên COVID-19 bi yekîra biaxifin, têlefona **National Coronavirus Helpline** 1800 020 080. Ev xet herroj bo 24 demjimêran vekirî ye. Bo kargûzarîya tercumanîya belaş pêl 8 bike

Hun dikarîn li ser malpera Department of Health and Aged Care zêdetir agahdarî bi 63 zimanên cûde ên din bi dest bixin: [www.health.gov.au/covid19-vaccines-languages](http://www.health.gov.au/covid19-vaccines-languages)

Her weha ji hûn dikarin bi doktorên xwera an ji karbidestên profesyonel tenduristîyê ên taxa we re biaxifin.

Girîng e ku hûn bi çavkaniyên pêbawer û fermî yen wekî Department of Health Aged Care an ji Therapeutic Goods Administration agahdar bimînin.